

Nûbikaranîna metiryalan li ser xêra me giştan e



Her cara k utu rojnameyekê an pakêtekê didî navenda vegerandinê **rûdaneka girîng diqewime.**

Dûşekê kevn dibe rûpelek hesinî jibo erebeyê. Wek mînak besteyek podreya kincşûştinê dibe qutiye nû jibo solan. Rojnameya dûravêtî dibe rojnameyeka nû. Bi vî rengî madeyên xav ên xwezayê careka din tînan bikaranîn û enêrjiyê zêde tê salîfîn. Bi xêra vî karî, em gîst alîkariyê dikin ku cîhan bibe chekî baştir jibo jiyanê.

NÛBİKARANÎNA MADEYAN

Hemî kaxezên bestebendiyê û rojnameyên xwendî û dûravêtî tînan berhevkerin û bo navenda nûbikaranîna madeyan tînan barkirin da ku bibin kartûnên nû jibo bestebendiyê an berhemên din. Wek mînak renga bestebendiyên plastîkî bibin madeyên navxweyî jibo firçeya feraqşûştinê an guldankên gul û telîsên plansîkî. Feraqên şûşeyî û kartûnên pakêtan di pileya yekem da dibin madeyên nû jibo pakêtkirin. Renge qutî û bestebendiyên metalî bibin armator û rojnameyên dûravêtî û bikarhatî bibin parçeyên kaxezî yê aşpêxaneyê an careka din bibin kaxezê rojnameyan.

BERPİRSİYARIYA BERHEMÊNER

Li welatê Swêdê qanûnek bi nave Berpirsiyariya Berhemêner heye. Ev qanûn bi wê wateyê ye ku kompaniyên berhemêner an firoşerê pakêtan an kelûpelên pakêtkirî divê berpirsiyariya berhevkerin û nûbikaranîna berhemên xwe bigirin ustiyê xwe. Em li kompaniya pişk û parî ya berhevkerina kartûna bestebendî û rojnameyên dûravêtî (At Förpacknings- och Tidningsinsamlingen, FTI) vê berpirsiyariyê dewsa kompaniyên pêk tînin. Armanca me ev e ku karê nûbikaranîna jibo we hêsan bikin û di eynî demê da sûd û berjewendiyên karê nûbikaranîna jibo jîngehê herî pirr bikin. Jibo bidestxistina vê armancê em hewcedarê alîkariya we ne.

RAWESTGEHÊN NÛBİKARANÎNA MADEYAN

Kompaniya FTI'yê berpirsiyariya tevahiya rawestgehên bêyî kedkar ên nûbikaranîna metiryalan li Swêdê girtiye ustiyê xwe. Hûn rojnameyên dûravêtî û madeyên pakêtkirinê yê plastîkî, kaxezî, metalî û feraqên şûşeyî bi mebesta nûbikaranîna didin vê navendê. Eger hûn li nav avahiyekê dijîn ku bixwe şûneka hevpar jibo nûbikaranîna madeyan heye, divê kaxezên pakêtkirinê û rojnameyên xwe yê dûravêtî bibin vê şûnê.

ZANYARIYÊN PİRTİR

Li malpera me bi adresa www.ftiab.se/hitta-atervinningsstation her wiha hûn dikarin nêziktirîn rawestgeha nûbikaranîna madeyan peyda bikin û demên nobeta din a valakerin û paqijkirina wê derê bibînin. Li vê malperê her wiha rênimûniya cudakerina madeyan, hin fîlm derbarê nûbikaranîna madeyan, pêşniyar û agahkerin derbarê çalakiya vê kompaniyê jî li ber dest in.

Eger pîrsek derbarê nûbikaranîna rojname û kaxezên pakêtkirinê heye, hûn dikarin ji riya E-Nameya kontakt@ftiab.se an hejmara tîlêfona **0200 88 03 11** bi me ra bikevin tîkiliyê. Eger we pîrsek derbarê kils û zibilên mezînan û gir, guherîna bo kamposê, kils û zibilên elektrîkî û babetên din ên tîkildarî kils û zibilan heye, ji kerema digel berpirsên navçeya xwe bikevin tîkiliyê an zanyariyên pirtir di vî warî da li malpera www.sopor.nu bibînin.

Cudakirina pirtir a metiryalan

Bona ku em bikarin îmkana nûbikaranîna kils û zibilên zêdetirê dabîn bikin, em hewcedarê alîkariya we ne. Tevahiya bestebendiyên divê ku vala û hema bêje hişk bin. Bestebendî û pakêtên ku madeyên din jî bi wan ra hene, divê li gorî madeya ku fikir dikin pirtirîn giranî yaw ê ye, bîn cudakirin.

Em siopasiya we dikin.



MADEYÊN PAKÊTKIRINÊ YÊN PLASTÎKÎ

Mînak: Botl, qutî, telîsên plastîkî, bestebendiyên ku dubare tijî dibin, tiyopên plastîkî, telîsên Çîpsan û Stîrofom (Styrofoam).

- ✓ Stopper û deriyên rakîn. Telîsên bestebendiyên xwe yê plastîkî li nav şûna taybet vala bikin; Bi awayekî ku her kîjan cuda be. Bi vî rengî hûn cudakirina metiryalan jibo qonaxên din hêsan dikin.
- ✗ Berhemên Plastîkî ku ji madeyên pakêtkirinê nînin, wek mînak Mobel û pêlîstok wek kils û zibilên mezin an bermayiyên navmalî cuda bikin. Botl û şûşeyên vala bidin firoşgehan û pereyên berdêlê werbigirin.



KAXEZÊ BESTEBENDIYÊ

Mînak: Qutiyê ava mêwe, şîr û makaronî, telîsên kaxezî yê kirrînê, qutiya solan, boriya parçeyê destavê û kartûnên kaxezî.

- ✓ Bestebendiyê saf bikin û bitewînin ser hev. Bestebendiyên biçûk daynin nav bestebendiyên mezintir da ku cihekî kêmtir dagir bikin.
- ✗ Pakêta nameyannameyan bavêjin nav zibildankên navmalî an zibildankên ku tên şewitandin. Rojnameyên dûravêtî, belgêyên reklaman û yê weke wan bavêjin cihê taybetî rojanmeyên betal.



QUTÎ Û BESTEBENDÎ

Mînak: Qutiya konservê, qutiya vala ya Spirî, Tiyop, derî û dûşek, botl û qutiyê vala yê reng.

- ✓ Deriyê qutiyê konservê lêviktûj bitewînin. Derî/derpûşê tiyopan ramekin.
- ✗ Qutiyên bi reng an label wek madeyên bixeter cuda bikin. Hesinên rizî, borî û pêvekên av û rêjavê, tabe û tiştên din ku wek bestebendî nayên hesab, divê wek zibilên gir an zibilên navmalî bîn radestkirin. Qutiyên vala bidin firoşgehan û berdêla wan werbigirin.



FERAQ Û BESTEYÊN ŞÛŞEYÎ

Mînak: Botl û şûşeyên bêreng û rengdar.

- ✓ Serpûş û deriyên rakîn û li gorî wê metiryalan cuda bikin. Feraqên ûşeyî yê rengî û bêreng bavêjin cihê taybet.
- ✗ Botlên ku pereyê berdêla radestkirina wan heye bidin firoşgehan û diravê wê bistînin. Feraqên çînî, siramîk û cinsên din ku bestebendî nayên hesab, divê wek zibilên mezin an zibilên navmalî bîn radestkirin. Lampe û çira divê bo navendên ku kedkarên nûbikaranîne li wir hene bîn radestkirin.



ROJNAMEYA DÛRAVÊTÎ

Mînak: Rojname, kovar, heftename/Carname, katalog, Brûsor, belgêyên reklamê, lînivîsk û kaxezê nivîsîn û dîzaynê.

- ✓ Beriya dûravêtinê, kaxezên çapî yê telîsê plastîkî an kaxezê reklamê yê girêdayî bi wan bîn cudakirin.
- ✗ Pakêtanameyan û pirtûkên bi cild bavêjin nav zibilên navmalî an zibilên ku tên şewitandin. Telîsên kaxezî yê kirrînê, kartûn û tiştên wiha bavêjin nav cihê taybetî wan.